



# JI EDÎTOR...

Xwendevanê hêja em kovara Silava ya sala 2024 bi hejmara xwe a yekemîn ya meha Sibatê û Adarê ji we re pêşkêş dîkin. Meha Sibatê di dîroka gelê Kurd de şopeke xwe ya res hêştîye, ji ber di vê mehê de Serokê hemû mirovahiyê hat dîlgirtin.

Ev dîlgirtin di şexsê Rêber Apo de li ser hemû mirovahiyê hat ferz kirin, ji ber iro fikir û felsefeya Rêbertî tenê xwe di kurdan de sînordar nehiştiye, belavî hemû cîhan û nava gelan bûye. Di eynî demê de bi hatina meha adarê re buhar jî li deriyê me dixe. Meha Adarê ji bi tekoşîna xwe tê naskirin, agirê laşê Mazlûm, Rehsan, Zekiye û bi sedan fedayiyên weke wan in. Dîsa bi 8'ê Adarê re jî hemû jin dubare berxwedan, tekoşîn û îradeya xwe tînin bîra her kesî û ji xwe re dîkin bingeha nûbûyîneki. Xwendevanê me yê hêja li ser van bingehan me xwest di derbarê van mijaran de nivîsên ku çawa bibin bersiv ji komployê re ji we re pêşkêş bikin. Di eynî demê de em ê bi zimanê Rêbertî di kovarê de ji we re nîşan bidin çawa ku Rêbertî bi projeya Netewa Demokratîk bersiv dide komplô. Pê re jî bi perspektifê Jinên Ciwan hûn ê nas bikin em ê çawa projeya. Netewa Demokratîk pêkbînin ku azadiya fizîkî ya Rêber Apo mîsoger bikin. Di dawiyê de em bawerin ku di vê kovarê me de hûn ê tiştên ku balê we dikşîne bibînin, em hêvidarin bi şopandina we ya vê hejmarê hûn kêfxwêş bibin.

**RÊBER APO NAS BIKIN Û PÊRE JIKAN BIKIN**

# Naverok...

## 3 PERSPEKTİFA SEROKATİ

"Bi Modernîteya Demokratik bersiv didim komplo"- Rêber APO

## 8 PERSPEKTİFA JİNÊN CIWAN

"Sala 2024 sala pêkanîna azadiya fizîkî ya Rêber APO ye"

## 11 PORTRE

Şehîdên Newrozê: Şehîd Zekiye Alkan



## 12 JINEOLOJÎ

"Weke zanisteke azadiyê gelo jineolojî mimkun e?"

## 18 EM DI DÎROKÊ DE VEŞARTÎ NE

Çiroka Kawayê Hesinkar



## 20 DOSYA TAYBET

"Her roj kirina 8'ê Adarê sirra Xwebûnê ye"

## 28 BINASE!

Tegeha: Modernîteya Demokartik

## 32 BÎRANÎNÊN GERILLA

"Dîlgirtina Rêbertî, dîlgirtina me hemîuya ye" - Ş. Bager Adiyaman


## 38 NAME JI BO SEROKATÎ

Nameya jinek ciwan ji Rojava ji bo Serokatî



# **“BI MODERNİTEYA DEMOKRATİK BERSIV DIDIM KOMPLO”**

Ji Pareznameya Rêber APO



## **REVANDINA DERVEYÎ QANÛNÎ YA BI KOORDÎNATORIYA DYAYÊ**

Sibeha 15'ê Sibata 1999'an saet 8'an, Şefê Protokolê yê Wezareta Karêna Derve ya Kenyayê hat avahiya sefaretxaneyê û Sefîrê Bilind Kostoûlas bir cem Sekreterê Daîmî yê Wezareta Karêna Derve Kathoûrima. Dema ku Kostoûlas kete hundirê odayê, Şefê Îstîxbarata Kenyayê Noan Arap Ta jî li wir bû. Rewş jî nû ve tê nirxandin. Eşkere bû ku bi koordînatoriya DYAYÊ, li Wezareta Karêna Derve ya Kenyayê hikumetên Yewnan (Di şexsê Pangalos û Kostoûlas de) û Kenyayê ji bo revandina min bi awayekî ne qanûnî rewşa dawî nirxandine û encama vê jî ji 4'ê Sibatê ve ji hikumeta Tirk re ragihandine.

Ji xwe derkete holê ku dema Sefîrê Bilind Kostoûlas li Wezareta Karêna Derve ya Kenyayê ev hevdîtin dikir, balafira tîma Tirk a pênc rojan li balafirgeha Entebbe ya Ûgandayê bû, ji bo bê balafirgeha Kenya-Nâirobiyê li benda işaretê bû. Heman piştî vê hevdîtinê, balafirga Tirkîyeyê ya li Ûgandayê heman rojê saet 11'an ji bo rabe işaret wergirtiye. Li ser vê yekê nîşaneyên rastî yê li ser balafirê hatin jêbirin û al û nîşaneyên sexte yên Malezyayê li ser hate kirin. Saet 13:55'an jî ber bi balafirgeha Jomo Kenyatta ya Nâirobiyê bi rê ket.

Balafira ku xwe li balafirgeha Nâirobiyê danî li vir sekinî. Her tişt berê hatibûn amadekirin. Li gorî lihevirkirinê, tîma Tirk ji balafirê derneket. Sefîrê Bilind ê Yewnanîstanê Kostoûlas jî Kalenderîdîs girt cem xwe û wê

hewl bida min îqna bike ji bo ji avahiya sefaretxaneyê derkevîm. Piştî ku ji derî derketim jî wê rayedarê Kenyayê Noan Arap Ta û polîsên wî ez birevanda û radestî tîma Tirk a li balafirgehê bikira. Wê eşkere bibûya ku li hevkirina veşartî wiha ye.

## **EZ YEKSER BIRIN CEM BALAFIRÊ**

Sefîrê Bilind Kostoûlas di çarçovuya peymana bi rayedarên Kenyayê re kirî, li gorî wezifeya jê re hate dayin wê saet 16:30'îbihata sefaretxaneyê. Pênc wesayitên ji plaqeşa hikumeta Kenyayê, sê cîpêni bi tîpa Land Rover saet 18'an li hewşa mala Sefîrê Bilind Kostoûlas park kirin ku 14 roj in li wir bûm. Yênu ku ez bi zorê bi cîpê revandin, rayedarên ew-lekarî û îstîxbarata Kenyayê bûn. Hemû kesen di wesayitan de mirovên reşik bûn; çar kes bûn. Balkêş e; dema ku em gihîstîn balafirgehê ti polîs an jî benda kontrolê tune bû. Em yekser ketin nava balafirgehê û yekser ez birin cem balafirê. Vê yekê jî nîşan dida ku her tişt ji berê ve hatiye plankirin. Mirovên reşik wesayit li ber deriyê balafira li balafirgehê sekinandin. Hemû kesen li derdora balafirê mirovên reşik bûn. Kincê sivîl li

wan bû, hinekan berçavka reşik xistibûn çavê xwe. Hinek jî çavê wan kesk bû, zerik bûn, çekêni otomatîk di destê wan de bûn. Dibe ku Îsraîlî bin, lê belê bêhtir dişibîyan Amerîkiyan. Bi îhtîmaleke mezin endamên CIA û MOSSAD'ê bûn.

## **TÎRK TENÊ DI HUNDİRÊ BALAFIRÊ DE BÛN**

Heta kêliya li balafirê hatim si-warkirin Tirk tune bûn. Tirk di hundirê balafirê de bûn. Dema ku ketim hundirê balafirê, Tîma Taybet a Tirk bêyî ku tiştekî bêje yekser ez li erdê dirêj kir. Rahîstîn her tiştên bi min re, bi bantan her derê min girê dan, banteke qalind bi çavêni min ve kirin û ez li paş balafirê danîn. Hişê min hemâ bêjin bi temamî ji serê min çûbû. Min bi xwe re nedidît bimeşim, ne di wê rewşê de bûm ku bifikirim. Piştî du saetan hatim ser hişê xwe. Balafir du caran daket; cihê destpêkê Misir bû, ya duyemîn jî Îsraîl an jî Qibrîs bû. Dema ku ez bi keştiyê anîn girtîgeha girava yek kesî ya ku bi taybetî hate amadekirin, sibeha 16'ê Sibatê bû. Heman rojê (16'ê Sibata 1999'an) Serok-wezîr Bulent Ecevît ji raya giştî re eşkere kir ku min anîne Tirkiyeyê.

## **HELWESTA MIN A DESTPÊKÊ NEAXAFTIN BÛ**

Li balafirê dema ku çavên min vekirin, tişta ku min dixwest bêjim ev bû: "Ev serketin ne ya we ye. Yênu ku ji we re dibêjin ku do staniyê bi we re dikan, ne durust in. Dixwazin vê lîstikê bi her du aliyan re bilizin. Min ti carî di jminatî li Tirkan nekiriye. Ji ali yê dayikê ve girêdana xwînê jî heye. Aştî û biratî yekane rêya rast e. Zelal e ku ez ê têkoşîna xwe ya ji niha û pê ve li ser vê bingehê bimeşînim." Ya rast, helwesta min a destpêkê ew bû ku heta dawiyê neaxivim.

### **JI BO PÜÇKIRINA KOMPLOYÊ...**

Yekser eşkere bû ku helwesta min a neaxaftinê wê bike ku komplot veşartî bimîne. Ji bo karibim detayên komploya li ser mirina min hate amadekirin eşkere bikim û pûç bikim, divê bijîm. Ev yek a herî rast bû. Her tişt li ser mirina min hatibû amadekirin. Bi komployê de amadekarî kiribûn ku min mîna paketeke ji hewayê radestî şovenîzma Tirk bikin û lîstika "Li arena Romayê bike xwarina li ber şêran" amade bikin. Encama ku dixwestin li ser mirina

min bi dest bixin, "Tirkiyeyeke windakirî, Kurdên windakirî" bû. Xwestin bi rêya komployê rê li ber şerekî bi dehan salan vekin. Yek ji xiyanetên herî mezin ê sedsalê xwe hîn weke dost û alîgirê azadiyê nîşan dida; xwedîyên helwesta leheng û mezlûman jî wê bi awayekî bê rehm tine bikira û bida jibîrkirin.

### **SİSTEMA ÎMRALIYÊ YA KÊ YE?**

Sîstema Îmraliyê ji aliyê sîstem/cîhana kapîtalîst ve bi taybetî li dijî min hatîye amadekirin. Li vê sîstêmê cihê hiqûq û qanûnan nîne. Ji bo îradeyê qels bike, bi demê re birizîne û teslîm bigire hatîye amadekirin. Hem ji aliyê mercên girtîgehê ve hem jî ji ber revandina li derveyî hiqûqê, dikarim bêjim ku girtîgeha Îmraliyê weke Gûantanamo ya destpêkê (Proto Gûantanamo) xistine dewrê. Ji destpêka vê pêvajoyê ve însiyatîf di destê DYAY'ye de ye, Îngîlistan û Îsraîlê roleke girîng lîstine. Di revandina min de Gladiyoya NATO'ye, CIA, MOSSAD, MI6, MÎT a Tirk û îstîxbarata Yenwan hevkarî kirine.

## **EZ MEHKÛMÊ KOMPLOYA NAVNETEWEYÎ ME**

Bizmarê destpêkê li Moskowayê hate lêdan; bi serma xiyanetê he-siyam. Bizmarê duyemîn li Romayê hate lêdan; li pêşberî dek û dolabên zirav ên kapîtalîzmê min dest ji rûmeta xwe berne-da. Bizmarê sêyemîn li Atînayê hate lêdan; li pêşberî xiyaneteke dostaniyê ku berê qet nehatiye dîtin, lal bûm, tevizîm! Bizmarê çaremîn li Naîrobiyê hate lêdan; radestî Tirkiyeyê hatim kirin ku bi cezayê îdamê li min digeriya. Di encama 'komploya çar mix' de li girtîgeha girava yek kesî ya Îmraliyê ya li Derya Marmarayê -Goristana Hades- hatim bicikrin û di çar mixê de li benda mirinê (darvekirinê) hatim hiştin. Lewma ez ne mehkûmê Tirkiyeyê me, ez mehkûmê komploya navneteveyî me.

## **BI MODERNÎTEYA DEMOKRATÎK BERSIVÊ DIDIM KOMPLOYÊ**

Bi pêvajoya aştî û çareseriya demokratîk re ku min li Îmraliyê afirand, min planêwan pûç kir. Cezayê îdamê hate rakirin, lê belê heta mirinê wê min di nava tecrîda giran de li 'korîdo-


ra mirinê' ku ji îdamê jî xerabtir e û gav bi gav ber bi mirinê ve dibe, bihatima hiştin. Ev statuya ku hîn jî di nav de têm hiştin, bi pêkanînên tecrîda mutleq di-dome. Di nava van şert û mercan de jî bi derfetên kêmî serê derziyê, bi rêya parêznameyên xwe min ê modernîteya demokratîk weke alternatîfa sîstem/cîhana modernîteya kapîtalîst a komployer baifiranda û bi vî rengî bibûma bersiv. Bi vî rengî komploya navneteveyî ji aliyê teorîk ve wêbihata teşhîrkirin û pûçkirin. Di pratîkê de jî wê hewldanê min ên ji bo aştî û çareseriya demokratîk dewam bikira.

Li dijî lîstikên li ser Tirkîye û me tênlîstin, me hewl da xeta hiqûqa demokratîk û feraseta parastina rewa bidin rûniştandin. Ez li ser vê bingehê banga yekîtiyê li Kurdan dikim.



*“Hûn nikarin gelekî di  
nava çar dîwaran de  
bigrin.”*

Rêber APO



# *“Sala 2024 sala pêkanîna azadiya fizîkî ya Rêber APO ye”*

- Perspektîfa Jinên Ciwan -

Bi salan tekoşînekî pir dijwar tê meşandin. Ji ber ku tekoşîna ku em didin meşandin bê navber e. Di sala derbasbûyî de ango di sala 2023 yan de jî di her milî de him di milê şer de, him di milê berxwedaniyê de him di milê êrîşen ku pêşketin de, saleke ku di dîroka berxwedaniyê de xwedî girîngiyek bû. Taybet di vê salê de berxwedanî û gehremantiyên ku di çiyayên

Kurdistanê de ji milên gerîlayên azadiyê ve hate meşandin ji bo pêvajoyê bû perspektifa herî girîng. Gerîla bi îradeya xwe bi tarzê xwe yê nûjen dan diyar kîrin ku ji pêvajoyê re çawa bibin bersiv. Bêguman gerîla hêza xwe, îradeya xwe, baweriya xwe, felsefeya xwe ji Rêber APO digrin ku afrînerê jiyanâ azade.



## 15'Ê SIBATÊ - ROJA RES

Rêber APO bi fikir û felsefeya ku afirandî ve çawaniya hêza avakirina jiyana pêwîst nîşanî tevahî cihanê da. Ya ku komplô û tecrîdê têk dibe jî ev fikir û felsefeya jiyanê ye ku belavî tevahî cihanê bûye. Îro tevahî cîhan li derdora fikra Rêbertî li azadiya xwe digerin. Ji bo vê ji her deverê cîhanê li derdora hemleya ji bo Rêbertî hatibû destpêkrin bûn xelekek. Di vê meha sibatê de ku em 25 salên komployê li pey xwe dihêlin, em berxwedaniya Rêber APO ya ku mohra xwe li dîrokê daye dibînin. Di 25 salan de tekoşînek pir mezin, berxwedaniyek nefes bi nefes ji milê Rêber APO ve hat meşandin. Em di vê 15'ê Sibatê de dikevin sala 26'an a komployê. Bêguman dema em li salên ku derbas bûyî dinêrin em rewşa xwe ya tekoşînê jî tê de dibînin. Divê em hemû ji xwe bipirsin me li hember komployê çikir? Me bi xebatên kirî ve rewşa tecrîdê çiqas guhert? Ev girêdayî asta tekoşîna me ya perwerdê,çalekî rêexistinkirin, avakirina sistêma netewa demokratîke.

Sala 2023 em weke jinên ciwan me dest bi hemlê bi navê "Jin jiyan azadî serbixe azadî" kir. Kedek hat dayîn û rengekî girîng li qada Rojava derket pêş. Jinên ciwan xwe seferber kirin ji bo hemlê serkeftî pêkbînin. Xebatekî girîng hat meşandin bi rengên dewlemend û cûr bi cûr çalakî hatin pêşxistin, navenda hemlê jî ev bû ku azadiya fizîkî ya Rêbertî pêk bînin. Jinên ciwan di sala 2023'an de her li qadan bûn, reng û dengê xwe ji dunyayê re ragihandin. Bi çalakiyên weke meş, xebatên zanekirinê, belavkirina fikir û felsefeya Rêber APO di nav gel de, ev bandoreke xwe yê erenî di nav gel de pêşxist. Jinên ciwan bi hemleya "jin jiyan azadî serbixe azadî" gihaştin encamekî ku bi riya xebatên zanebûnê weke perwerde dikarin gavên xort di şoreşê de bavêjin û îradeya xwe derxin pêş. Di vê hemlê de encamekî xurt hat bi destxistin, rêexistinbûnekî xurt pêşket di alî perwerdekirin, rêexistinkirin û çalakîkirin de. Heta astekî encam hat girtin ema em hîn negihaştin armanca xwe ya ku azadiya fizîkî ya Rêber APO û avakirina hişmendiya

netewa demokratîk di xwe de dihewîne. Ji bo sala 2024'an em hemleya "jin jiyan azadî serbixe azadî" bi hemleya "Ji Rêber APO re azadî, ji pirsgirêka kurd re çareserî" bikin yek û bi rêbâzên dewlemend em hemleya xwe hîn geştir bikin. Em karib-in hemû ferdên civakê tevlî vê hemlê bikin, her kes bi rengê xwe, bi çandê xwe tevlî vê hemlê bibe. Ji bo hemleya me hertim biherike û bi encam be pêwîste em xwe perwerde bikin û xwe rêexistin bikin û li ser vê esasê bikin çalakî.

## PLANSASIYÊN 2024

Yekemîn armancê hemleya me ev in:

- Azadiya fîzîkî ya Rêber APO xistina navenda hemû xebatê me û belavkirina fîkir û felsefeya Rêber Apo ji her ferdekî re û Rêbertî kirina terzê jiyanê.
- Xwedî derketina li nirxên şoreşê û di destpêkê de şehîdên şoreşê.
- Parastina welatê xwe ji hemû êrîşan, ev jî bi rêbazên şerê gelê şoreşgerî. Yanî her ferdek xwe rêexistin bike û xwe berpirsyar bibîne li hemberî êrîşen heyî.

- Xwedî derketina li jinan, zarok û hemû civakê.

- Xwedî derketina li ekolojiya jiyanê û tendirustiya civakê.

- Bi vê hemlê xwe gihadina hemû sûriyê û rojhilata navîn.

- Ev hemle li hemberî şerê taybet, şîdetâ teknolojî, dagirkirî, fiuş, madeyên hişbir, tacîz, tecawîz û kuştin derdikeve.

- Li hemberî olperestî, zayend-perestî û netewperestî tekoşin di asta jor de meşandin.

- Hedefa vê hemlê nasnameya jina azad mîsogerikirin.

- Ev hemle ji bo avakirina ci-vakekî exlaqî û politîke.

Sala 2024 bi "Jin jiyan azadî, serbixe azadî" wê azadî biserbikeve. Di eynî demê de ev hemle hemû jinêni ciwan, xwendekar, kedkar, rewşen-bîr û siyasetmedar divê hemû bi hev re dengê xwe bikin yek û wisa komplô têkbibin dawîya faşîst û qirkeran bînin û tola tevahî jinan rakin. Di dawiyê de emê bi rengê jinan û netewa demokratîk 8'ê adarê pîroz bikin.

# Şehîd Zekiye Alkan

## - Portre -



Ji bo gelê Kurd Newroz ji mêt ve bûye sembola berxwedanê û her sal di 21'ê Adarê de bi hatina biharê ji aliyê bi milyonan Kurd ve tê pîrozkirin.

Di heman demê de 21'ê Adarê ji bo gelê Kurd jî bûye roja têkoşînê, ji ber ku gelek berxwedêran ji bo azadiyê canê xwe fedâ kirine.

Zekiye Alkan ku di 21'ê Adara 1990'î de xwe şewitand wiha dibêje: "Eger azadî bi hêsanîbihata bideshtixtin, Zekiye bedena xwe nedida ber agir."

Jina ciwan Zekiye di sala 1970'î de ji dayik bû, dema ku cara yekem tevgera azadiyê nas kir, li Zanîngeha Dîcleyê ya Amedê (Amed) doktorî dixwend.

Li navçeya Nisêbînê ya gîrêdayî navçeya Mêrdîn Mêrdînê 13 hevalên jin ên gerilla şehîd dikevin.

Zekiye ji şehadeta wan pir bandor bû. Di heman demê de wê çirokên li ser heval Mazlûm Dogan dixwend, ê ku ji bo Newrozê li Zindana Amedê ku hê ji weke yek ji girtigehê herî navdar ên dîrokê tê zanîn, bi sê kibrîtan agir berda bendea xwe.

Di 21'ê Adara 1989'an de Zekiye Alkan bi hevalên xwe re rûniştibû, ji nişka ve rabû ser xwe û hemû pereyêni di bêrika wê de hebûn şewitandin.

"Tu çi dikî?" hevalên wê pirsî.

"Newroz herî baş bi agir tê pîrozkirin", wê bersiv da.

Di 21'ê Adara 1990'î de Zekiye Alkan hilkişıya ser sûrên dîrokî yên Keleha Amedê û xwe şewitand.

Rêber APÖ got, "Çalakiyên Zekiye Alkan ku di Newrozê de bi pêla azadiyê bilind dibe de agir berda bedena xwe, mîşan dide ku têkoşîna azadiyê ne hêsan e."


Ji ber vê yekê agirê ku di pîrozbahiyê Newrozê de tê pêxistin, behsa berxwedana ku di Newrozê de canê xwe fedâ kirine, dike.

Di hemû pîrozbahiyê Newrozê de gelê Kurd jîn û mîrên mîna Zekiye Alkan û Mazlûm Dogan ên ji bo azadiyê canê xwe fedâ kirine bi bîr tînin.



*“Weke zanisteke  
azadiyê gelo jineoloji  
mimkun e?”*

- Jineoljî -



Zanistên civakî yên mirovî (bi gotina, biwêja kevn beşerî), ji şaxêñ zanistan, navê zanista pozitif lê dîkin, ji kîmyayê heta biyolojiyê, ji tibê heta genetikê ger bi nêrîna mér bin mirov pê matmayî namîne. Zanista ku ew bixwe jî qad û amûreke deshilatiyê ye, li derveyî dînyaya xiyala deshilatiya mér nikaribû pêş biketa. Nêrîna jinê ya di zanistê de bi îstîsnaî xuya kiriye, ya bêbandor ma, yan jî bi zanista bi çavê mér ve hat kirin, di nav de heliya.

### JINEOLOJÎ ÇIYE?

Mirov dikare jineolojiyê weke nêrîneke zanistî ya di zanistên civakî de (bi giştî di zanistê de) nêrîna deshilatiyê û têgihîştina nêr

paşve dibe û derî li feraseta zanisteke nû vebike jî pênase dike, bi merceka jinê li ser jinê lêhûrbûn dike tarîf bike. Rêber APO, weke “li ser zîhniyeta deshilatdar a mér mudaxeleyeke radîkal” pênase dike. Jineoljî, idîayeke di zanistên civakî de veguherînê hildigire. Her wiha nêrîna jineolojîk, li hember deshilatiya nêr weke alternatif tê dîtin.

### KEDA JINÊ GEREK WERE DÎTIN

Tevî zehmetî, astengî û dorpêçkirina hat xwestin li jor bê vegotin, jin û nêrîna jinê, li hember çarenûsa herî kêm sed û pêncî sal in li serê tê ferzkirin serî radike. Mirov dikare bêje ku nîvî duyem ê sedsala 21, li hemû herêmên dînyayê nebe jî, li erdnîgariyeke

fireh wê bi giraniya jinê be. Dema mirovahî carek pirs û pirsgirêkê bavêjin holê, çareserî jî wê zû dereng were. Ger mirov bibêje wê zanistên civakî yên pêşerojî jî bi merceka jinê û bi navend jin pêş bikeve wê ne jîrikî be. Îcar mirov dikare ji îro ve nîşaneyên vê bibîne. Têgeha jineolojiyê avêtina holê, bi têgehê din be jî rexne û îtîrazêni li hember zanistên mirovî û civakî yên bi giraniya mîr û bi nêrîna nêr bilind dibin, binê kemasîyan û nebesiyên di têgihiştina temametî de xêzkirin elametên girîng in.

Lê ez difikirim ku li pêsiya jineolojiyê du xeterî, bi wateyek din kemîn hene: Ya yekemîn; mubaxalekirina belênaya; zanista jinê-zanista mîr, di feraseteke wê temametiya zanistê tune bike de asêbûn, yanê zanistên civakî yên serserkî disekekin dema mirov bixwaze li ser lingan bide sekinandin gewdeyê texrîb kirin; şoresgeriyê ne weke hilweşandineke ku danehevê tune dihesibîne, lê ji bo danehevê hilpekîne asteke jortir pêpelük qebûlkirin, ger ev bê jibirkirin. Ya duyemîn jî; jineolojiyê, di zanistên civakî de ji feraseta şoresger a bi navend jin zêdetir, weke manîvelayeke (qirase) siyasal û bîrdozî, kirina weke amûr. Bi gotineke din, anîna rewşa amûra gotinî ya utopyaya civaka nû ya bi giraniya jin a tevgera Kurd a ku heyecan dide.



## RÊBER APO KU CARA YEKÊ JINEOLOJIYÊ WEKE ZANIST AVÊTIYE HOLÊ Û PÊŞ XISTIYE

Sedema ku ez wiha difikirim; di hin metin û encamnameyên di kongreyê jineolojiyê de, gerîlayêni jin, berdevkên tevgera jinê ya kurd, dema mijarê tînin ziman û di hin nivîsên li ser mijarê de tê ifadekirin; kulta (perestina) Serok dikeve pêsiya lêgerîna zanistê: ji bo "Rêber APO ku cara yekê jineolojiyê weke zanist avêtiye holê û pêş xistiye", ji "kesê zanyar" re. Ev vegotin ji mijara esasîn zêdetir cî digirin. Ji aliyê din ve, jineolojiya ku bi armanc û idîaya wê bibe zanista jinê radibe, ji zanistîyê zêdetir, di cihekî bîrdozî de bicîkirin; li şûna ku mijarê nîqaş bike, kûr bike, rihetiya dirûşmekirin, -qet nebe di nav kadroyê militan de- zêde ye. Rêber APO; şoreşa civakî ya sedsala pêsiya me de, rol û girîngiya jinê rast têgihiştîye. Di vê mijarê de nêrîn û pêşbîniyê wî daxînin asta dirûşmên ziwa, ji bo jineolojiya mirov dikare weke zanistike civakî ya bi nêrîna jinê û bi navend jin dikare di zanistên civakî de şores ava bike pênase bike, handîkapî (asêyi) sereke ye. Ji ber ku zanist, li derveyî her cure çanda bîatê, bi derbaskirina dogmayê olî û bîrdozî pêş dikeve. Gavêن xwe yên herî pêş jî, di çarçoveya derfet û sînorêن her demê de, bi deshilatiyê re şer kiriye

û avêtiye.

Mercek û zanista jinê jinanî bibe, nayê maneya belênaya zanista mér- zanista jinê. Tê maneya ku ji nérîtiya zanistê bê paqikirin û vegere mirov. Ev jî, di deshilatiyê de jin bikeve şûna mér na, ancax bi avahiya xwe ya tê zanîn û tê pêkanîn, deshilatî bixwe were vemirandin û bi guhertina têgeh û zîhniyeta deshilatiyê dibe.

Dawiyê de tiştê ez dikarim bêjim; avahiya deshilatiyê ya nér ku ji-nan jî dorpêç kiriye û di nav xwe de helandiye, heta ku bûyera deshilatiyê bixwe û lêgerîna deshilatiyê neyê derbaskirin, azadbûna civak, jin û zanistê, her wiha pêşketina zanista jina azad jî tam nikare tam mimkun bibe. Dîsa jî, weke parçeyekî utopyaya civaka nû, weke armanceke mirov dikare li dû here li ber me ye.



## Ji penûse Serokatî ji bo 8'ê Adarê

Ji bo bi te re bijîm  
Di navbera me de,  
ji Adem û Hewa ve  
Dîriyên hatin çandin  
bêrakirin  
Dîwarên hatin bilindkirin  
bêrakirin  
Ji bo vê:  
Çîna despêkê  
Mêraniya derewkar  
were têkbirin  
û agirê ku şaristaniyê diziye  
bê girtin  
Ji bo vê:  
Min şerekî  
berdelî hemû Pomethrûsan  
girt ber çav  
Dinyayê li hember xwe dit  
û li welatê Promethe  
bi xayînî hatim dilxistin  
Ey dayika pîroz,  
û jîna sewdayê...

Rêber APO

# Çîroka Kawa yê Hesinkar

- Em di dîrokê de veşartî ne -

Di berê de...

Padîsahekî xerab ê Asûrî hebû ku jê re digotin Dahhak. Ev padîşah û padîşahiya wî ji ber xerabiya wî nifir hatibûn kirin. Roj nema qebûlkir ku derkeve û giya nema şîn dibûn. Nifirek din jî hebû, ku du mar bi milên wî ve girêdabûn, dema mar birçî bûn, êşeke mezin pê hisiya û tenê tiştê ku birçibûna maran têr dikir mejiyê zarokan bû. Ji ber vê yekê her roj du zarok li gundên herêmê têr kuştin û mejiyê wan didin maran. Kawa Hesinkarê herêmê ji 17 zarokên xwe 16 ji marên padîşah re kiribû qurban û hesinkar jê nefret kiribû.

Dema ku xebera kuştina zaroka wî ya dawîn a keçik digihê-je wî, ji bo ku keça xwe xilas bike planek çêkir, Kawayê hesinkar li şûna ku keça xwe bike qur-

ban, pezek kir qurban û mejiyê pezê da padîşah. ferq nedidît, gava yên din fêlbaziya Kawabihîstin, hemûyan jî eynî tişt kirin, bi şev zarokên xwe şandin ciyê, bi Kawa re ew ê sax bin, zarok li çiya mezin bûn û Kawa artêşek çêkir ku dawî li serdestiya padîşahê xerab bînin. Gava hejmara wan têra xwe zêde bû, ji çiya daketin û bi ser kelehé de girtin, Kawa bi xwe derba kujer ji padîşahê xerab Dahhak re hilbijartibû. Ji bo ku xeberê bigihîne gelê Mezopotamyayê, wî agirê mezin ku ezman ronî kir û hewa ji xerabiya desthilatdariya Dahhak paqij kir. Wê sibê roj dîsa hilhat û şînkahî dîsa dest pê kir. Ev destpêka (rojeke nû ye) an jî wek ku di zimanê kurdî de tê nivîsan-din (NEWROZ) e. Yek ji rêûresmên cejna Newrozê di nav kurdan de ew e ku jin û mîr,



pîr û zarok, bi cil û bergên kurdî yên kevneşopî xwe dixemilînin. Ew ji malê derdikevin nav xwezayê û xwarinên kevneşopî amade dikin û hîn jî berdewam dike ev adet di nav kurdan de û di nav gelên din de jî ku Newrozê pîroz dikin, wek faris, afgan û azeriyan jî wek van gelan pîroz dikin. Di nav Mîrektiya Kurda ya Medyayê de û Padîşahiya Kurdan ji bilî Kurdistanê, axên mezin ên wekî Iran, Afganîstan û Azerbaycanê jî di nav xwe de dihewand. Di Newrozê de xelk şahî û serdana endamên malbat û hevalên xwe dikin û diyariyan didin hev. Ev adet rîyek baş e ku meriv bi hezkiriyêن xwe re bicive û reh û girêdanên hevaltiya kûr xurt bike. Newroz di heman demê de derfetek e ji bo çalakiyên çandî yên kevneşopî, yên ku pratikên hevpar bi adetên herêmî re, wek helbest, muzîk, şahiyêن li hewayê vekirî an pêşandanên li kolanan ên herêmî pêk tîne. Piştî ku rîheval Mazlûm Dogan di 21'ê Adara 1982'an de li girtîgehêن Tirkiyeyê çalakiya xwe pêk anî û diyar kir ku em teslîm nebin û li hemberî xiyanetê diseiki-



nin. Sama Yuca, Fîkrî Baygeldî, Ronahî û Bêrîvan ev rîwîtî jî domandin. agirê Newrozê ku bi Kawayê Hesinkar dest pê kiribû heta ku gihişte destê rîhevalê mezlûm Mazlûm Dogan û heta niha berdewame.Bi milyonan însan her sal dadikevin qadan û roja berxwedan û têkoşînê pîroz dikin.Ev agir wê her pêketî be heta ku em li ser piyan bin li dijî zalim û zordara.



# HER ROJ KIRINA 8'Ê ADARÊ SIRRA 'XWEBÛNÊ' YE

- Dosya Taybet -

Di her kêliya jiyanê de, sirek ya xwebûnê heye. Ev sira xwebûnê, di hemû zindiyên ku bi hebûn û heyîna xwe jiyanê cihreng û bedew dikan de heye. Di xwezayê de, bi aheng û melodiyeke newaze ev sira xwebûnê kamil dibe. Li gel mirovan jî sira herî mezin ya xwebûnê di jiyana li derdora jinê hatiye hûnandin de xwe dide der. Cîvaka mirovan, li ser hîmê jin, jîyan û xwebûnê afrîneriya xwe domdar kiriye. Ev rastiya mezin hebûn bi jiyanê, jîyan li gel hêza maneyê û afrînera xwebûnê jinê bi heqîqet kiriye. Afrînerî, xisleteke ya berdewamiya jiyanê ye.

Dema ku dibêjin 8'e Adarê bêguman tiştên gelek xweş û bi kelecan tê bîra mirov. Ji ber ku ev roj cejna jinên tevahî cîhanê ye. Di vê rojê de jin xwe dixemlinin û derdi Kevin kolanan, şahî û dîlanê dikan. Lê di heman demê de ev roj roja ji hemû hêzên desthilatdar, kedxwar, zayendperest, tecawûzkar û paşverû tol girtine. Pergala baviksalarî di vê rojê de tê hilweşandin.

Di vê rojê de 129 jin hatin şewitandin, ji bo mafêñ xwe yêñ asayî jiyanekê wekhev xwestin. Lê ew hatin şewitandin. Niha jî di vê rojê de êdî bi hezaran zayîn û vejîn çêdibin.

Edî ne tenê di vê rojê de hemû rojan jin peşengtiya jiyana azad û wekhev dike. Jina Kurd mînaka wê ya şenber e ku, li hemberî kedxweriyê şer dike û têdikoşe. Jina Kurd di kesayeta rêheval Semayan de xwe nû dike, dil û mejiyê xwe zindî digire. Êdî li her deverê, li her kolanê bi deng û reng û hişmendiya jinê xweşik dibe û dengê wê bilind dibe. Tenê ev roj dernakeve kolanan û pêşengiyê nake, her demê munasebetan jin derdi keve û pêşengiyê dike. Bêguman ev hemû bi keda Rêber APO heyani roja me ya îro hatiye. Ji ber wê Azadiya Rêbertî destpêkê weke erka hemû jina ye ku, bi yek dengî li hemberî vê tecrîdê rabin. Edî tu kes nikare dengê me kêm bike. Ji ber ku di nava hemû gerdûnê de belav bûye xwe bi xwezayê re kiriye yek.

## 8'Ê ADARÊ WATE KIRINA JI- YANÊ YE

Agirê bedena Mazlum û Semayan îro geş dibe li ser ruye cihanê, mirov çiqasî vê rojê bi lêv bike jî kême. Ev roj rojên gelek girîngin ji bo tevahî jinan. Bi agirê bedena xwe li derdora Rêbertî bûn xelekek ji agir. Ji 8'ê Adarê heyâ 21'ê Adarê bûne hêviya gelan.

Çawa ku "Jina Eminî" ji bo Rojhilat b çirûska azadiyê. Kezîzerên tunelan şerê dîrokî di meşînin ji bo dayîk û zarokên pêşerojê re bûne hêvî. Di pêşengtiya jinan de 8'ê Adarê diber ruhê têkoşîn û berxwedaniyê. Jin bi deng, reng, hirs û kîna xwe têkoşîn û berxwedaniyâ xwe pîroz dikin. Bêgûman jiyanek azad û pîroz bi azadiya fizikî ya Rêber APO re pêkane.

Ev yek jî ne dure pir nezê. Em her roj û her dem bi rihê têkoşîn û berxwedaniyâ 8'ê Adarê tevahî rojên xwe bi têkoşînê bijin. Têkoşîn û berxwedanî bi xwere jiyanek azad tîne. Çawa ku kezîzerên di tûnelan de govenda azadiyê di gerînin, bi ken û çirûskên çavêن xwe azadiyê belav dikin û heskirina xwe li hember Rêber APO didin diyar kirin. Hesretên di dilê xwe de bi şerê azadiyê re di honin. Ev şerê azadiyê hêvî dixe di nava dilê dayîkan de. Dayîk bi tillîliyên xwe beriya her tiştê vê rojê li Rêber APO pîroz dikin silav û heskirinêن xwe rê dikin li Îmraliyê bi hêviyek mezin. Bi saya fikir û ramanêن Rêber APO 8'ê Adarê gîhişt wateya xwe ya herê rast. Di roja me ya îro de di pêşengtiya jinêن Kurd de hêviyêن mezin di tevahî jinêن cîhanê de avabûye. Ev roj bûye



heqîqeta azadiya jinê û hemû jin dîbin qêrîna azadiyê de di-herikin kolanan. Bi dirûsmeya "Jin Jiyan Azadî" re felsefaya Rêber Apo belavê cîhanê bûye.

## 8'Ê ADARÊ ROJEKE SEMBO- LA BERXWEDANE YE

Êdî ew roj di tekoşîna ku jin ji bo azadiya xwe dide de wek roleke start dilêyîze. Kar û xebatê ku jinê di saleke de meşandiye tê komkirin, li ser vê bingehê, ji bo saleke pêş gavên ku pewîste bêñ avêtin, kar û xebatênu ku bêñ kîrin jî têñ plankirin. Di vê tekoşîna dirêj de her tim ala azadiya jinê destê jinêñ cîhanê de hatiye hilgirtin û bi destan derbazî de stan bûyê. Di vê deme de jî ew al, bi herî xurt û çalak di deste jinêñ kurd, yên ku di kolanan de û yên ku di serê çiyan de çek bi destê wan de ye, bi heybet hatiye hildan û heya azadiyê jî wê bê hildan. Di pêşengtiya Rêber APO de, di encamê tekoşîna ku jinêñ çalakger yên ku ji bo azadiya xwe berê xwe dane serê çiyan dîroka jinê ya berxwedêr ku tû carî dev ji azadî û hebûna xwe bernedaye, lê nehatiye nîvîsandin, dest bi nîvîsandina wê hatiye kirin.

Xeta ku hevala Zilan bi çalakiya xwe ve starta vê da, hevala Sema hemû qirêjiyen ku zîhniyeta zilam li ser mêtî û laşe jinê de pêkanîbû, bi agir berdana laşê xwe ve şewitandin û ev qirêja hezaran salan paqij kir. Li ser wan çalakiyana ji aliye rêhevalê jinan Rêber APO ve 8'ê Adara 1998 an de "Bîrdoziya Rizgariya Jin" û rêgezên wê hate Îlankirin. Êdî tekoşîna ku ji aliye jinêñ cîhanê ve hatibû meşandin, li ser bingehêke xurt ya bîrdozîk de gihişt pergalê xwe ya xweser. Ev ji nû ve zivirîna cevherê mirov û civakbûnê re bû pêngavêke mezin ku di asta şoreşê de ye. Di roja me ya îro de jî, bi heman bîryarbûna xwe ve tekoşîna azadiya jinan di her qadê de bi pêşengtiya jinêñ Kurd de tê meşandin. Lê êdî dem dema hevgirtina hemu jinêñ cîhanêye. Pêl bi pêl çalakiyên ku heya vê sedsalê pêşketin, êdî dem dema komkirina wan û di bin banê Bîrdoziya Rizgariya Jinê de hatina li gel hev e. Li ser vê bingehê hemû hevî û armancame eve ku, her rojêñ me di asta zanist, hevgirtin û coşa 8'ê Adaran de bi ked û tekoşînan ve derbas bibe.

# Jinên pêşeng ên cihanê

## Emmeline Pankhurst

Emmeline jinek ji Înglistanê û 1858 tê dinyayê. Ji bo mafê jinan a dengdanê di hilbijartinan de tekoşînekê mezin dimeşîne. Di amrekê ciwan de dest bi xebatê dike. Ji ber tekoşîna Emmelinê û gelek jinên ditir 1918 mafê dengdanê ji jinan re li gelek welatan tê dayîn. Wisa bû pêşenga jinên cihanê di tekoşînê ji bo mafê jinan.

## Roza Luxemburg

Roza Luxemburg 1871 li Almanîya tê dinyayê. Roza di dawiya sedsala 19-an û destpêka sedsala 20-an de bû pêşenga tevgerên sosyalîst ên şoresser ên Polonya û Almanya. Şoressgerekê, niviskarekê û felesofekê ye. Rewşa jinên kedkar ên cihanê gelekê dahûrandinê dike û encamên van dike bingeha tekoşîna xwe. 15'ê Çilê 1919 ji aliyê istixbaratê alman vê tê kuştin.

## Roza Parks

Roza 1913 li Amerîka ji dayîk dibe. Vê demê însan bi cermê reşik bi netewperestî gelekî rû bi rû dimînin. Mafê însan ên bi cermê spî zedêtir bûn. Ji bo mafê gelê xwe û taybet ji bo jinên reşik Roza tekoşînekê mezin dide meşandin. Ji ber ku li hemberî bêmafî ti carî bê deng nema, bû sembola tekoşîna gelên demokrasîxwaz li Amerîka û giştî cihanê.



# Dîroka 8'ê Adarê - 8'ê Adarê di cihanê de



## 8'Ê ADARÊ 1908

Li New York (Amerîka) jinên kedkar ku di terzîxanê de kar dikirin, ji ber şert û merçen kar ên pir xirab, derketin û prosteto kirin. Terzîxanê dorpeçkirin û derî girtin. Ji bo serhildana jinan bitepsînin, xwediye terzîxanê agîr berdan. Di encamê vê sewatê de 129 jin jiyana xwe ji dest didin.



## TEBAXÊ 1910

Di duyemîn konferansa jinên sosyalîst a navneteweyî de Clara Zetkîn

8'ê Adarê wekê roja jinên cihanê pêşniyar dike. Ji bo bibîranîna 129 jinên kedkar ku di sewatê New York de jiyana xwe ji dest dan.


Pêşniyara Clara Zetkîn tê êre kirin.



## 8'Ê ADARÊ 1917

Di serhildanê karkerên jin ên li Petrogradê (Sankt Petersburga îroyîn) de ji aliye Bolşevîkan ve weke roja yekem a şoreşa Rûsyayê hat qebûlkirin.





### 8'Ê ADARÊ 1998

Rêber APO ji bo pîrozkirina roja jinêñ cihanê diyari- yekê pir bi wate dide hemû jinêñ cihanê.

5 rêgezên birdoziya rizgariya jinêñ ûlan dike. Rêber APO dibêje: "Ez vê di- yariyê hemû jinêñ cihanê yên azadîx- waz dikim."



### 21'Ê ADARÊ 1998

Sema Yüce piştî şes salan li girtîgehê dimîne, li dijî dîlgirtina Rêber APO, di sala 1998an de xeta Zilan ji xwe re dike bingeh û li dijî esaret, încar û tunekirinê di 21ê adarê de bedena xwe dide ber agir.

Sema Yüce piştî dermankirina 80 rojan a li Nexweşx-aneya Cerrahpaşayê ya Stembolê, di 17ê hezîranê de ji ber xweşewatê jiyana xwe ji dest da. Bi çal- akiya xwe di heman demê de jî giredan- bûna xwe bi xeta birdoziya rizgariya jinê nîşan dike.



### 8'Ê ADARÊ 2015

Hêzên Gerîllayêñ jin YJA-Star j bo pîroz- kirina 8'ê Adarê törenekî eskerî ya bi heybet li dar dixin. Bi sedan gerîllayêñ jin tevlî törenê dîbin û roja jinêñ cihanê pîroz dîkin.



# Tegeha: Modernîteya Demokratîk

- Binase! -

Serokatî hebûna Modernîteya

- Modernîteya Demokratîk û Modernîteya Kapitalist kîleke hev wekê dû cem pênase dike.
- Çigasa ava Modernîteya Kapitalist jî xurt bê, kîleke vê hertim jî ava
- Modernîteya Demokratîk diherîke û ti carî qût nabe, nasekîne, zûha nabe.
- Kanîya ava Modernîteya Demokratîka di civaka xwezayî de veşartî ye.

Hem wek têgîn hem jî di herikan-dina dîrokê de ji ber sedama cihê ku digre û rengê xwe yê dide jiyan-a civakê dîsa ji bo fêmkirina dema borî, niha û dema pêş modernîte xwediye girîngiyek mezin e. Di vê watê de du modernîteyên sereke yênu ku mohra xwe bi awayekî bi bandor jiyana mirovahiyê dane ango modernîteya demokratîk û modernîteya kapitalist bi hêmanen wan ve naskirin, ji bo rast fêmkirina jiyana mirovahiyê pir girînge.

## EV PEYV JI KÛDERÊ HATIYE?

Modernîte, wek têgîn tê payîn ku cara despêkê li Romayê hatiye bikaranîn. Ev têgîn ji bo taybetmendî, çanda giştî û ya rêuresmê, feraset, bawerî, zanist, şêwaza jiyanê û hwd nirxên manewî û maddî yêni di demek diyar de hatiye jiyan kirin tê bikaranîn. Bi kurtasî ger ji bo serdemek ku tê de ev nirxên navbohurî hatine jiyan kirin modernîte were gotin wê ev pênase di cih de be. Di serdema ku jê re modernîte tê gotin de ji ser rêuresma û şêwaza jiyanê ci zêdetir bi bandor be, ew rengê xwe dide wê modernîteyê ango modernîte dibe şêwaza pênasekirina wê.



## DÛ CEM ÛN CIVAKÊ

Dema dîroka mirovahiyê li gor vê were nirxandin, bi xetên stûr miro dikare modernîteya demokratik û modernîteya kapitalist wek du modernîteyê sereke ku mohra xwe di dîroka mirovahiyê dane bi nav bike. Di derdorê pêncsed salên dawî yê herikandina dîrokê mirovahiyê de ev her du modernîte weke du çemên sereke herikîne. Carna yek ji van li gor ya din hêj bêhtir bi gej herikiye, carna jî ya din. Her çiqas her yek ji van çeman herdem hewldaye bi hêmanên xwe yê xwesser biherike jî bandor li ser hevûdu kirine, bi hevre ango zikhev de herikîne. Li gorî dem, dewran û mekana herikî de lez û bando ra van carna zêde bûye û carna jî kêm bûye. Hevûdu bandor kirine, ji hevûdu kêm kirine. Kêmkirina yekî pir caran bûye zêdekirina ya din, lê tu car her duyan jî nikaribûne hevûdu bi awayekî giştî tine bikin. Ev herikandina zikhev de ya bi nakokî, hevrikî û têkoşînên dijhev dagirtî heyâ roja me ya îro jî berdewam dike û di encamê de, ji van her du ya kîjan bighêje serkeftinê wê asta hêz, amadekarî û xebatên hêmanên wan diyar bike.

### SÊ LINGÊN MODERNITEYA DEMOKRATİK

Ev her du modernîte jî xwe ser sê hêmanên sereke yên dij hev ava dikin û xwe bi amûrên wan gurçûpcê

dikin. Modernîteya kapitalist xwe ser kapitalizm, endustrîyalîzm û dewlet netew; modernîteya demokratik jî xwe ser civaka exlaqî û politik, eko-endustrî û netewa demokratik (konfederalîzma demokratik) ava dike.

Wek tê zanîn mirovatî ji serê sedî nodûheyş (%98) ji dîroka xwe ya xwezayî bi awayekî komûnal û demokratik ya xwe dispêre fera-seta çanda jin dayîkê jiyankiriye. Anglo di vê dîrokê de ya rengê xwe daye serdemê modernîteya demokratik e. Weke ji rê derketina vê dîroka civaka xwezayî di van derûdorê pêcsed salên herî dawî de rengê serdemê bûye kapitalist ango modernîteya kapitalist rengê xwe daye şêwazê jiyana civakî. Di vê pêvajoya demê de modernîteya kapitalist bi sê hêmanên xwe yên sereke hema bêje weke şevreşekî xwe berdeya ser asoyên spîberfî yên nirxên civaka xwezayî.

### DERKETINA MODERINTEYA KAPITALIST

Di modernîteya kapitalist de kapitalizm, bi her cûre amûrê deshilatdarî, kara herî zêdê û amûrên dij mirovahiyê xwe birêexistin dike û xwe berdide tevahî çaviyên jiyana civakê. Kapitalizm, ji bo xwe bighîne aramanca xwe ya dij civakê hetta qirkirina civakê her cûre rê û rîbazî jî xwe re rewâ dibîne û ji xerckirina nirxên civakê yên herî pîçûk jî xwe dûr nade. Ji bo vê jî

